wetzikon
Schule



# Vexwandin ji bo agahdarkirina Dê û bavên zarokan ji bo "salek berî destpêkirinahêlîna zarokan"

**Şemî, 1. Pûşper 2024**
Seet ji 8.30 (heta 12.00an)

**Primarschule Feld, Neubau**
Kreuzackerstrasse 15, 8620 Wetzikon



Malbat û dê û bavên hêja,

Havîna 2025an, wê zaroka we were hêlîna zarokan – Ev yek ji bo hemû malbatê bûyereke xweş e.

Niha hûn ji îro ve van pirsan ji xwe dikin:

- Ez çawa dikarim zarokên xwe ji vê re amade bikim?
- Sazûmana xwendegehan li kantona Zurichê çawa ye?
- Sibeheke hêlîna zarokan çawa bi rê ve diçe?
- Gelo li bajarê Wetzîkonê derfeteke zarokên min jê sûd bigirin heye?

Ji bo destpêkirina keç an kurê we ya hêlîna zarokan, em we vedixwînin tevlêbûna vê roja agahdarkirinê. Di vê rojê de hûnê li ser gelek mijaran werin agahdarkirin û bersivên pirsên xwe bistînin. Mamosteyên hêlîna zarokan wê ji we re qala jiyana rojekê, ya li hêlîna zarokan bikin û xebat-karên pispor wê li ser gelek çalakiyên li xwendegehê yên hûn jê sûd bigirin, agahiyan bidin we. Û hûnê karibin bi mamoste û xebatkarên xwendegehê re jî têkiliyan deynin.

Emê bi hevnasîna we ya di demeke nêz de dilxweş bibin.

Stadt Wetzikon
Schule

Thomas Ruppanner
Leitung Bildung

Claudia Bosshardt
Geschäftsbereichsleitung
Bildung

## Agahdarkirina di heşt xalan de

1. Zaroka min niha dikare çi bike?
2. Bipêşdebirina li malê ya jiyana rojane.
3. Defetên li Pirtûkxaneya Olî
4. Destwerdana zû – Navenda Malbatan li Wetzikonê FiZ
5. Sazûmana xwendegehê ya li Kantona Zürichê
6. Jiyana rojane li hêlîna zarokan
7. Defetên çalakiyên rojane li xwendegehê
8. Komên lîstike û navendên lênêrînê

Agahdarkirin qasî seet û nîvekê didome û her serê deh xulekan xwe nû dike. **Destpêkirina agahdariya dawî seet 10.45an e**.


Agahdarkirin ne ji bo zarokan e. Emê ji bo zarokên we yên biçûk, lênerekê diyar bikin, hûn dikarin deynin wir (**regist-ration pêwîst!)**.

**Werger û lênêra ji bo li ber zarokan be?**

Tu dikarî herî dawî heta roja **12 Gulan 2024** li ser qoda QR-daxwaza werger (tercuman) an keseke li ber zaroka we bisekine ji me bixwazin.

# Planê cî

**Primarschule Feld, Neubau**
Kreuzackerstrasse 15, 8620 Wetzikon




Parkplatzmöglichkeit (beschränkt):
→ bei Pfeil (P), Zufahrt über Bahnhofstrasse, Kreuzackerstrasse

**Stadt Wetzikon | Schule**
Guldisloostrasse 1
8620 Wetzikon

schulverwaltung@wetzikon.ch
www.schule-wetzikon.ch

**Kontakt Claudia Schadl**
Assistentin Leiter Bildung

Direktwahl 044 931 23 20
claudia.schadl@wetzikon.ch